



KAXÊZA AGAHDARIYÊN BO BEŞDARAN

Hûn bo beşdariya xebateke lêkolînê hatine vexwendin. Beriya hûn biryar bidin ku beşdar bibin an na, bo we girîng e ku hûn fehm bikin ev lêkolîn çima tê kirin û ev dê çi bihewîne. Ji kerema xwe demekê veqetînin bo bi awayekî baldar xwendina van agahiyan.

Ev lêkolîn di derbarê çi de ye?

Lêkolîn çîrokên şexsî, rêçên jiyane, torên piştgirî û piştevanîyê û berhemên hunerî yê têkildarê hîsa sirgûnê yê hunermendên ji Tirkiyeyê qeyd dike. Bi **'sirgûnê'** em behsa kesên wisa dikin ku li cihek an welateke ne mala xwe ya yekem dijîn û bi gelemperî ji ber sedemên siyasî, civakî û herwiha sedemên aborî jî bi hêsanî nikarin veqerin. Meseleya girîng **rola hunerê** ya di fehmkirina xweyîtiyên siyasî yê ji rewşa jiyana sirgûnê peydebûyî ye.

Ev lêkolîn di nav xwe de çi dihewîne?

Lêkolîn **hevpeyvînên** ligel wan beşdaran dihewîne ku li sirgûnê ne an kesên meyldarê vê forma jiyane ne û/an yê ji ber fikrên xwe yê siyasî/îdeolojîk **di bin rîskê de** ne, û/an yê daxilê hilberîna hunerî ya têkildarê jiyana sirgûnê bûne. Ji ber ku proje axaftina li ser mijarên ihtimalen hessas dihewîne, **tedbîrên etîk di dewsa parastina ewlehiya we de ne.**

Kî lêkolînê li dar dixê û finanse dike?

Lêkolîn ji teref **Komîsyona Ewropayê** weke beşeke Bûrsiyerîya Marie-Sklodowska-Curie ya Pieter Verstrate tê finansekirin ku ew rêveber û lêkolînerê serkêş ê projeyê, li Enstîtuya Xebatên Şanoyê ya Zanîngeha Free ya Berlînê ye.

Kî lêkolînê nixand?

Ev lêkolîn ji teref **Komîteya Etîkî ya Navendî** ya Zanîngeha Free ya Berlînê hat nixandin û qebûlkirin. Bo ihtimala kontrola etîkî, belgekirina bi hûrgilî ya proseya qebûlkirinê di dosyeyê de cih digire.

Çima hûn hatin hilbijartin?

Hûn hatin hilbijartin ji ber ku mihtemelen hûn **xwedan tecrubeya rasterast a rewşa jiyana sirgûnê** û/an **projeya hunerî ya têkildar** in, an jî hûn ligel hunermendên xwedan van tecrubeyan kar dikin.

Ez mecbûr im ku beşdar bibim?

Hûn bi kêfa xwe ne ku dixwazin beşdar bibin an na. Heke hûn biryar bidin ku beşdar bibin dê ji we were xwestin ku formeke razîbûnê îmze bikin. Lê hûn dîsa jî serbest in ku kengê bixwazin bêyî destnîşankirina sedemekê jê vekişin.

Ez dixwazim beşdar bibim, divê çi bikim?

Dê beşdariya we mihtemelen bi yek an zêdetir hevpeyvînên ligel lêkolînerî be û ihtimal e ku alîkarekî/ê jî hebe dema werger lazim be. Hevpeyvîn dê bo we di dem û ciheke guncav de were pêkanîn, ligel hewcedariyên ewlehiyê yê bo we. Ew dê li derdora saetekê dewam bike. Herwiha em bijareyên **telefon an Skypê** jî pêşkêş dikin.

Çi li agahiyan tê?

Agahiyên ku ji we tên girtin dê li agahiyên ji beşdarên hevpeyvînên din werin zêdekirin û ev dê were analîzkirin û bikaranîn bo sazîkirina arşîveke online, raporeke gihiştina vekirî, postên blogê, pêşkêşiyên û gotarên lêkolînê. Beriya weşanê, li gor daxwazê transkrîpsiyon dikare bi we re bê parvekirin ku hûn kontrol bikin heke transkrîpsiyon bi awayekî rast hatiye kirin an na. Dema anonîmî teqez were xwestin, navê we yê rastî û hemû agahiyên ku rê li ber dîtina nasnameya we vekin dê bi tu awayî neyên nîşandan ji bo rêzgirtina li hember maf û berjewendiyên we. **Ji kerema di forma razîbûnê de bi hûrgilî bidin zanîn heke pêdiviya we bi anonîmîzekirinê dîtir hebe di weşandina encaman de.**



Yan veşarîti û parastina daneyan?

Hemû agahiyên dibe ku hûn bidin dê bi awayê herî tekûz werin veşartin. Hevpeyvînkare dê hin notan bigire û dibe ku dengê we qeyd bike lê hemû agahiyên ku hûn di hevpeyvînê de bidin dê bi temamî werin anonîmîzekirin. Dê kodeke nasnameyî bidin qeyda dengê we û ev dê di dewsa navê we de were bikaranîn. Hemû daneyên şexsî yê di derbarê we de dê li databaseke bi şîfreyê parastî werin veşartin ku bi awayekî tekûz veşartî ye. Hemû dane dê bi awayekî ewle werin veşartin li gor çarçoveyên standardên ewlehiya daneyan, parastin û veşarîtiya yasayî ya li gor yasayên neteweyî yê Alman û Yasaya Ewropî ya Pêkanîne bo Yekparetiya Lêkolîne. Piştî projeya lêkolîne, ev dane dê werin arşivkirin û transfer bikin hard driveke cuda. Daneyên xam dê piştî du salên tarîxa dawî ya projeya lêkolîne (1ê Adara 2025an) werin reşkirin heke hûn bo arşivkirîne destûreke dîtir nedin.

Kî dikare bigihîje agahiyan?

Bes lêkolîner û alîkar dê bikarin bigihîjin hemû daneyan. Dibe ku Komîteya Etîkî ya Navendî bigihîje ku kontrol bike heke lêkolîn bi awayê qebûlkirî tê kirin an na.

Heke ez biryar bidim ku beşdar bibim û paşê biryara xwe biguherînim çi dibe?

Heke piştî razîbûna beşdariya hevpeyvînê, hûn paşê di derbarê beşdariyê de biryara xwe biguherînin, **hûn kengê bixwazin dikarin ji lêkolîne vekişin** (dema hevpeyvînê û piştî hevpeyvînê bi xwe jî). Tu agahiyê ji we hatî girtin dê li lêkolîne neyê zêdekirin.

Dezavantaj û rîskên mihtemel ên beşdariyê çi ne?

Em bawer dikin ku rîsk pir hindik in. Em fehm dikin ku telebeke zêde li ser wextê we heye û nerehetiyê beşdariya vê hevpeyvînê heye. Heke hûn bixwazin, hûn serbest in ku her gav ji hevpeyvînê vekişin an jî bo demekê dûr kevin. Agahiyên ku dikarin bi awayekî şexsî an jî profesyonel zirar bidin we dê neyên bikaranîn. Her tim hûn dikarin axaftinê xwe û dengê xwe bo veşarîti an jî rîska şexsî dubare kontrol bikin. Mafê we heye ku hûn qeydên deng û/an vîdeoyê yê bo beşekî an temamê hevpeyvînê red bikin.

Heke tişteki şaş biqewime çi dibe?

Bi qasî ku hatiye çavdêrîkirin, rîskên eleqedar ên beşdariya vê lêkolîne têkildarê eşkerebûna nasnameya mirovekî/ê û parastina kêma agahiyên taybet, bi taybetî jî dema pirsgerêkên siyasî û/an şîroveyên îdeolojîk ên li ser rewşa heyî ya Tirkiyeyê ne. Tebdîrên bo kêmkirinê, heke ne bi temamî ji holê rakirina van rîskan be jî, bi baldarî hatine tetbîqkirin. Heke hûn ji ber beşdariya vê projeyê zirar bibînin, amadekariyê taybet a bo telafiyê nîn e. Heke hûn ji ber îhmalkariya yekî zirar bibînin, ew çax dibe ku bo we bingehê tevgera yasayî hebe lê divê hûn heqê wê bidin.

Ez dikarim bi kî de şikayet bikim?

Heke di derbarê vê lêkolîne de tu şikayeteke we hebe, hûn di destpêkê de dikarin bi lêkolînerê re parve bikin. Heke ev negihîje encameke baş û hûn bawer bikin mafên we bi awayekî hatine binpêkirin, ew çax divê hûn ligel Anika Froehlich, Alîkariya Koma Beşa VI: Lêkolîn, Şêwira Yasayî ya Lêkolîn û Transferan têkilî deynin ku ji vê navnîşana e-mailê: anika.froehlich@fu-berlin.de tel.: +49 30 838-73621, fax: +49 30 838-472120 dikarin bigihîjin wê.

Têkiliya bo Agahiyên Dîtir

Heke pirseke we ya dîtir hebe, ji kerema xwe serbest bin ku ligel Rêveberê Projeyê têkilî deynin, **Dr Pieter Verstraete** bi e-mailê: p.verstraete@fu-berlin.de, telefona mobîl: +49 163 224 0656, telefona ofîsê: +49 30 838 4 69931.

Saps bo beşdariya lêkolîne.
Û spas bo wextê we!



Razîbûna Beşdariya Xebateke Lêkolîne

Sernavê Xebatê: "Jiyane Sirgûnkirî li ser Dîkê: Artîstên Tirkîyeyê li Xaçîrêkên Partîkên Estetîk ên Nû û Xweyîtiyên Siyasî" (Nimreya Bûrsê: 893827)

Sazî: Zanîngeha Free ya Berlîne, Enstîtuya Xebatên Şanoyê

Lêkolîner: Dr. Pieter Verstraete (Rêveberê Projeyê)

Alîkar: Özgür Bahçeci

Beşdar: _____ (Ji kerema xwe navê xwe binivîsin.)

Armanca bingehîn a vê xebatê ev e:

Lêkolîna tecrube û tevkarîyên pîşekarên şanoyê yê sirgûnkirî û hunermendên din ên ji Tirkîyeyê beramberê nîqaşên acil ên li Ewropayê yê têkildarê jiyana sirgûnê. Ji bo vê yekê, proje çîrokên şexsî qeyd dike. Hunerên şanoyê, lê ihtimalen herwiha formên din ên hunerê tên nîqaşkirin bo feydeya wan a fehmkirina xweyîtiyên siyasî yê nû, nasnameyên hunerî û kirarê estetîk ên ji rewşa sirgûniyê derketî.

Armancên spesîfîk ê lêkolîna pêşniyazkirî ev in:

- (1) Bi awayekî rexneyî nirxandina mitaleyên hunermendî yê nûjen ên hunermendên sirgûnî, bi riya berhemên wan ên hunerî û vegotinên wan ên têkildarê tecrubeyên wan, pirsgirêkên girîng ên sirgûna wan û endîşeyên giştî yê bo demokrasî, maf û hereketên mirovan.
- (2) Xêzkirina tor, sazî, nişîngeh û rêçên bikarhatî yê ji teref hunermendên bo Ewropayê Tirkîyeyê terkkirî.
- (3) Kişfkirina xweyîtiyên siyasî bi riya lîstîk û performansên şanoyê û rêyên ku tê de hunermend têkiliyên di navbera tevgera estetîk û siyaseta bibandor ji nû ve rave dikin ligel têkiliya derdorên xwe yê bajarî yê nû û wergirtî.

Di dema hevpeyvîne de dê ji we were xwestin ku:

Bersiv bidin pirsên di nav hevpeyvînekê de ku yê ku bi deng (bi qeydeke dijîtal) û ihtimalen vîdeo (bi riya amûrên telekonferansa online an jî kamereyeke dijîtal) dê werin qeydkirin.

Anonîmîzekirin û tedbîrên ewlehiyê hatine tetbîqkirin bo arşîvkirina daneyên we dabîn kirî. Pêdiviya we bi anonîmîzekirineke dîtir a nasnameya we heye di encama weşandinê de?

Na

Erê

Bi îmzekirina vê forma razîbûnê, hûn razîbûna xwe ya bi zanebûn a beşdariya vê xebatê diyar dikin.

Îmze _____

Cih, Dem _____